1 Hezîranê Rojnameya we Azadiya Welat


Azadiya Welat
Zarokên kurd ên dîlgî
RÊBERÊ PKK'Ê ABDULLAH OCALAN DÎSA BANGA DIYALOGÊ KIR
'Heta meha hezîranê divê gav bên avêtin'
Ocalan ji dewletê xwest ku heta meha hezîranê ji bo çareseriya demokratîk bikeve nava tevgerê. Ocalan encamên hilbijartinên 29'ê Adarê ji mînin 'Şoreşa Demokratîk' bi nav kirin
KDP-Îran: Başûrî erênî nêzîk nabin
GELEK MIJARÊN ESASÎ HIRBANDIN

li bayiyan e

## Îro dê Meşa Aştiyê bê lidarxistin

9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bi çalakî û bernameyên çandî yên cur bi cur dom dike. Di çarçoveya Mîhrîcana Amedê de piştî bernameyên şano, dîwana dengbêjan û nîşandana fîlman li qada Deriyê Çiyê konsera vekirinê ya mîhrîcanê pêk hat. Mîhrîcan dê îro bi meşa aştiyê û konsera girtinê bi dawî bibe. Meşa Aştiyê dê saet di 18:30'an de ji ber Parkormani dest pê bike heta ber salona dawetê ya Ava ya Dîclekentê dewam bike... RÛPEL - 6

## Pira Amed-Trabzonê

Lîstika Şanoya Bajar a Trabzonê ya bi navê 'Dengê Derve' li Şanogeha Dewletê ya Amedê hat nîşandan. Derhênera lîstikê Dîlek Guven ji bo projeya xeta Amed-Trabzonê wiha got: "Di navbera her du bajaran de pêşdarazî hene. Pêşdarazî bi hunerê ve dikare ji holê rabin. Hewcedarî heye ku mirov êdî hev fêm bikin û werin cem hev."... RÛPEL - 6

# Bi bilûra xwe ruhekî nû dida candaran

**Çend roj berê hosteyê bilûrê Qadir Ebdullahzade ku wekî bi navê Qalemer tê nasîn çû ser dilovaniya xwe. Qalemer bi bilûra xwe dixwest xweştirîn muzîkên millî biafirîne**

Bi her dengê ku ji bilûrê derdiket tevahiya laşê bîneran ketibû govendê, xwînek nû û ruhek taze dida canê wan. Wî bi bilûra xwe mizgîna pêşerojên baştir dida. Dengê ilahî û dilnişînê bilûrê ji sîlehên dijmin gelek bihêztir bû. Qalemer, di 11 saliya xwe de dest bi lêxistina bilûrê kir û ji wê rojê şûn de ji bo demekê ji bilûra xwe ya hesinî û reng zer ji xwe dûr nexist. Bilûra wî tenê emrazek ji bo xweşî û pirkirina demên betaliyê nebû, ew li kuçe, bazar û hwd. beşek ji xerca jiyana xwe ya rojane peyda bike... RÛPEL - 6



Hawar
Rojnameya Rojane
30 Gulan 2009
Şemî
Sal: 1
Hejmar: 25
Buha: 50 Kr

# Çi karê leşkeran li serê çiyan heye?

Di hevdîtina bi parêzeran de Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan operasyonên TSK'ê yên ku dibin sedema kuştina leşkeran nirxandin û wiha got: 'Parastina rewa, wekî mafekî pîroz e. Min berê jî gotibû. Pisîkek jî li dijî êrîşan xwe diparêze.' Ocalan pirsa 'çi karê te li ser wan çiyan heye?' kir û ji Erdogan xwest ku ji bo çareseriyê însiyatîfê bigire

### 'XWEPASTIN MAFEKÎ HERÎ XWEZAYÎ YE'

Di hevdîtina xwe de Ocalan li ser gelek mijarên aktuel ên di rojevê de ne sekinî û bi bîr xist ku PKK'ê bi xwe biryara bêçalakîtiyê ya heta 1'ê hezîranê girtibû. Ocalan li ser mijarê wiha got: "Lê operasyon zêde bûne. Bi zanebûn operasyonan pêk tînin. Operasyonan pêk neyne, bi ser wan de neçe, li çiyê karê te çi ye? Şansekî bide aştiyê. Çima rê li ber mirina ev qas ciwanan vedikî. Helbet li hemberî van, wê xwe biparêzin. Li hemberî êrîşan xweparastin, refleksa herî xwezayî ye."

### 'ÇARESERÎ DI DESTÊ ERDOGAN DE YE'

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan destnîşan kir ku dewlet vala nasekine, wekî ku tiştan dike xwe nîşan dide û wiha got: "Serokomar diaxive û dixwaze her kes pêwîstiya berpirsyariyên xwe bi cih bînin. Divê her kes vê rast fêm bike. Ev gotin ji bo nexşeya rê girîng in. Diviyabû DTP'ê piştî van gotinan pakêteke çareseriyê amade bikira û bida Serokomar û alîkariya wî bikira". Ocalan bi bîr xist ku însiyatîfa çareseriyê ya esasî di destê Erdogan de ye... RÛPEL - 2



## Kî li pişt van operasyonan heye?

Artêşa Tirk bi nêzîkbûna 1'ê hezîranê re li gelek deverên ku gerîla di rewşa parastinê de ye operasyon li dar xistin. Bi taybetî piştî ku li Çelê 7 leşkeran di operasyonê de jiyana xwe ji dest dan, li Tirkiyeyê nîqaşeke balkêş dest pê kir. Li gorî van nîqaşan, kuştina leşkeran nîşan dide ku PKK naxwaze çekan deyne. Lê heman derdor behsa endamên PKK'ê yên ku jiyana xwe ji dest didin nakin.

## Di 1'ê hezîranê de helwesta xwe diyar dikin

**SEROKATIYA** Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê bi daxuyaniyekê aşkera kir ku ew ê biryar û helwesta xwe di 1'ê hezîranê de aşkera bikin. Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku der barê kuştina 6 leşkerên li Çelê de bi cotstandartiyekê re rû bi rû ne û ji van kuştinan Serfermandariya Giştî û hikûmet berpirsyar e... RÛPEL - 4

## 'Divê dewlet jî bi qasî PKK'ê hesas be'

**HEVSEROKÊ** DTP'ê Ahmet Turk anî ziman ku PKK'ê ji bo çareseriyê pêşniyarên şênber kirine û yên vê pêşniyarê qebûl nakin bila alternatîfa xwe deynin holê. Turk, bal kişand ser operasyonan û destnîşan kir ku operasyon pêvajoya aştiyê dixe xeterê. Turk, ji saziyên demokratîk xwest ku bêdeng nemînin... RÛPEL - 4

## Ji saziyên Serhedê deklerasyona aştiyê

50 rêxistinên civakî yên sivîl û gelek kesayetên navdar ên li Wan û bajarên Serhadê der barê pêvajoya bêpevçûntiyê de deklerasyonek aşkera kirin. Di deklarasyonê de îmzeya 150 kesayetên navdar ên herêmê hene. Di deklerasyonê de bang li hemû aliyan dikin ku ji bo pirsgirêka kurd bi hîstiyar tevbigerin. Di deklerasyonê de ji bo çareseriya pirsgirêka kurd ev tişt hatine gotin: "Ji bo pêşiya nîqaşên çareserkirina pirsgirêka kurd vebe operasyon bên rawestandin û pêvajoya bêpevçûnê bê dirêjkirin. Pergala cerdevaniyê bê rakirin û ji bo cerdevaniyê qada îstîhdamê bê afirandin. Ji bo çareseriya pirsgirêkê gavên berbiçav bêne avêtin. Endamên DTP'ê û yên sendîka û rêxistinên civakî yên sivîl ji meha nîsanê ve hatine binçavkirin û girtin, serbest bêne berdan. Makeqanûneke nû ku hemû kesên civakê xwe tê de bibîne bê amadekirin."

## Ji bo mîtînga 31'ê gulanê belavokan belav dikin

Di çarçoveya mitînga 'Li Hevhatina Jinan' a di 31'ê gulanê de li Amedê pêk tê, ji Tirkiye û derveyî welat 500 rewşenbîr û nivîskar dê beşdarî forma bi rojeva kurdî pêk tê, bibin. Rewşenbîrên ku tê fikirîn di warê pirsgirêka kurd de bi heman nêrînê derkevin, dê bi kincên spî beşdarî mitîngê bibin. Ji bo mîtîngê ji aliyê jinan ve belavok têne belavkirin... RÛPEL - 7

## Mînaka Mandela jî bû sedema fezlekeyeke nû



Dozgeriya Komarê ya Amedê lêpirsîna ji bo axaftina Ahmet Turk ya di Newroza Amedê de kiribû qedand. Serdozger bi boneya ku Turk di axaftina xwe de 'propagandaya rêxistinê' kiriye li gorî hejmara zagonê ya xala 7/2'an destlênedana wî rabe. Fezlekeya ku hatiya amadekirin ji bo ku pêşkêşî TMMM'ê bibe şandine Wezareta Dadê. Turk, di Newroza Amedê de ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan mînaka Serokdewletê Başûrê Afrîkayê Nelson Mandela dabû.

www.arsivakurd.org

## Ocalan: Ji bo çareseriyê amade me

*LÎDERÊ PKK'ê* Abdullah Ocalan da zanîn ku ew bi xwe ji bo çareseriyê çi ji destê wî tê dike û wiha got: "Bang li birêz serokwezîr dikim. Di destê we de erk heye. Ji rewşa Menderes û Ozal dersan derxe. Hûn dikarin vê pirsgirêkê çareser bikin û roleke girîng bilîzin." Ocalan gumanên xwe yên ji ber gotinên rayedarên tirk ên der barê pirsgirêka kurd de anîn ziman û pirsa gelo "dixwazin bi gotinan havînê derbas bikin" pirsî.

Ocalan diyar kir ku heger ev gotin û nîqaş parçeyekî lîstikekê bin, dê ev yek rê li ber xetereyan veke û wiha got: "Hin rewşenbîr jî dibêjin tu plana AKP'ê ya ji bo çareseriya pirsgirêka kurd nîn e. Dibêjin AKP bi gotinan dixwaze havînê derbas bike. Ev çiqas rast e, bi rastî çareseriyê dixwazin, zextên Ergenokenê hene, an li hemberî wê zehmetiyan dikişînin? Ez bi xwe jî, vê gavê bersiva van pirsan nizanim".



*Ocalan di hevdîtina xwe ya bi parêzeran re de anî ziman ku ji bo çareseriyê divê Serokezîrê Dewleta Tirk Erdogan rola xwe bilîze.*

## 'Tiştê serokomar bike bisînor in'

*LÎDERÊ PKK'ê* Abdullah Ocalan destnîşan kir ku dewlet vala nasekine, wekî ku tiştan dike xwe nîşan dide û wiha got: "Serokomar diaxive û dixwaze her kes pêwîstiya berpirsyariyên xwe bi cih bînin. Divê her kes vê rast fêm bike. Ev gotin ji bo nexşeya rê girîng in. Diviyabû DTP'ê piştî van gotinan pakêteke çareseriyê amade bikira û bida Serokomar û alîkariya wî bikira".

Ocalan anî ziman ku serokomar bi serê xwe nikare pirsgirêkê çareser bike û wiha got: "Erka serokomar bi sînor e. Alîkarî pêwîst dike. Di vir de wezîfe û berpirsyariya esasî ya Serokwezîr e. Wekî aliyê kurd, DTP dikare dîtinan bigire, ji daxwazên kurdan pakêtek amade bike û ew jî vê binirxînin".

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan di hevdîtina xwe de got:

# Muxatabê çareseriyê Serokwezîr Erdogan e

**Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan guftûgo û hewldanên têkildarî çareseriya pirsgirêka kurd nirxandin û hişyariya, 'Heger ev lîstikek be wê gelekî xeteriyê biafirîne' kir. Ocalan destnîşan kir ku Serokomar nikare pirsgirêkê çareser bike û destnîşan kir ku berpirsiyariya bingehîn dikeve ser milê Serokwezîr Erdogan**




*LÎDERÊ PKK'ê* Abdullah Ocalan, roja çarşemê hevdîtina bi parêzerên xwe re pêk anî û der barê girîngiya parastina rewa, gotinên rayedarên tirk, êrîş û rexneyên li hemberî Tevgera Azadî û çareseriya pirsgirêka kurd de, dîtinên xwe anîn ziman. Ocalan parastina rewa, wekî mafekî pîroz nirxand û got: "Min berê jî gotibû. Pisîkek jî li hemberî êrîşan xwe diparêze û mafê her kesî yê parastina rewa heye".

**'Xweparastin refleksa herî xwezayî ye'**

Ocalan bi bîr xist ku PKK'ê bi xwe biryara bêçalakîtiyê ya heta 1'ê hezîranê girtibû û wiha got: "Lê operasyon zêde bûne. Bi zanebûn operasyonan pêk tînin. Operasyonan pêk neyne, bi ser wan de neçe, li çiyê karê te çi ye? Şansekî bide aştiyê. Çima rê li ber mirina ev qas ciwanan vedikî. Ji aliyekî Îranê bi ser gerîla de dişînî, ji aliyekî bi Iraqê re hevkariyê dikî û ji aliyekî jî operasyonan pêk tînî. Helbet li hemberî van, wê xwe biparêzin. Li hemberî êrîşan xwe parastin, refleksa herî xwezayî ye'.

**Êrîşên li dij DTP'ê...**

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan êrîş û zextên li dijî DTP'ê û saziyên kurd jî, wekî astengiyên li pêşiya pêvajoya çareseriyê nirxandin û got: "Ji aliyekî operasyonên li hemberî gerîla pêk tînin. Ji aliyekî dixwazin DTP'ê têk bibin. Heta hewl didin parlamenterên xwedî mafê destnedanê bigirin. Bi operasyonan, hewldana tunekirina gerîla û bi êrîşên li dijî DTP'ê nikarin pirsgirêkê çareser bikin. Heger hûn qadên siyasî yên kurdan teng bikin, operasyon dewam bikin, bi vî rengî bi ser gel de biçin, wê kurd jî neçar bimînin xwe biparêzin".

**'Pirsgirêk ne aborî, siyasî ye'**

Ocalan li ser gotinên Serokwezîrê tirk yên wekî wan 2 mîlyar pere şandine herêmê jî got: "Birêz Serokwezîr, heta pirsgirêka siyasî çareser nebe, pirsgirêka aborî çareser nabe. Divê berê pirsgirêka siyasî çareser bibe. Li pêşiya Tirkiyeyê 2 rê hene. Ya wê çareseriya demokratîk pêş bikeve û an jî wê pêvajoya şer û pevçûnî dewam bike".

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan banga xurtkirina xebat û hewldanên ji bo aştiyê li hemû derdoran kir û got: "Divê Kongeya Civaka Demokratîk, der barê pêvajoyê de gel baş agahdar bike û nehêle pêvajo were provokekirin".

Ocalan careke din bal kişand ser girîngiya Akademiyên Siyaseta Demokratîk û got: "Divê ev akademî werin avakirin. AKP bi xwe jî, xwedî 300 qadên perwerdehî ye. Li herêmê pirsgirêk zêde ne. DTP dikare van çareser bike. Wezîfeya siyasetmedaran çareserkirina pirsgirêkên civakê ye".

**'Tirkên spî'**

Ocalan di hevdîtina xwe de bal kişand li ser Îttihat û terakkiyê û got: "Operasyon bi djwarî û berfirehî dewam dikin. Kurê Menderes, der barê kuştina bavê xwe de hinek tiştan tîne ziman. Kiryarên li hemberî bavê xwe û berpirsyaran dizane. Ev klîkê ku li pêşiya çareseriya pirsgirêka kurd asteng in. Ev klîk xwedî mîrateyeke 100 salî ye. Ji sala 1905'an û vir ve dewam dike. Ev klîk tirkên spî ne. Di nava wan de tirkekî eslî nîne. Têkiliya wan, bi tirkîtiyê re nîn e. Tirkên ne tirk, tirkên spî ne." Ocalan 2 tiştên girîng destnîşan kirin: "Van kes û derdoran Sultan Abdulhamîd dorpêç kirin û têk birin. Piştre Mustafa Kemal dorpêç kirin."

Ocalan bal kişand li ser Şerê Azadiyê(Kurtuluş savaşı) û got: "Di Şerê Azadiyê de 3 enî hebûn. Eniyek çepgir û komunîst bûn. Eniyek Îslamî bû. Eniya din jî kurd bûn. Komûnîstan destek dane Şerê Azadiyê. Mustafa Suphî û hevalên wî, ji bo destekê, hatin Tirkiyeyê. Saîdê Nursî, Mehmet Akif û hevalên wan, destek dane Şerê Azadiya Tirkiyeyê. Kurdan jî, di Şerê Azadiya Tirkiyê de aktîf rol lîstin. Mustafa Kemal, di navbera her sê eniyan de navbeynkar bû û dengeyek pêk anî. Di Şerê Azadiyê de enî teva ligel hev bûn. Peymana vê hevkariyê jî Destûra Bingehîn a 1921'ê ye.

**Li bêdengiya demokratan rexne**

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan bêdengiya demokratên Tirkiyeyê jî rexne kir û got: "Rojev tijî ye. Şer û nîqaş hene. Li hemberî van demokrat çi dikin? Divê demokrat ji bo aştî û çareseriyê bikevin nava tevgerê. Bi taybetî yên ku xwe çepgir dibînin, wezîfeyeke mezin dikeve ser milê wan. Di vê çepgir û demokrat werin cem hev û eniyeke ku demokratan li Spanyayê li dijî Franco ava kiribû, ava bikin. Spanya ji ber wê têkoşînê bi ser ket û bû dewleta herî bi hêz û demokratîk ya Ewropayê. Divê demokrat û çepgirên Tirkiyeyê jî, pratîka eniya Spanyayê mînak bigirin û ji bo aştî û çareseriyê bixebitin". **STENBOL / ANF**

## 'Komkujiya Zanqirtê karê Ergenekonê ye'

*OCALAN,* destnîşan kir ku Ergenekon hêj xurt e û wiha got: "Li Tirkiyeyê ev enî, di rengê Şerê Taybet û Ergenekonê, hîn jî bi hêz in. Ji sedî 70 hêj di nava artêş û burokrasiyê de hene. Rast e, Hilmî Ozkok, 4 darbe dane rawestandin. Hilmî Ozkok, dema li ser kar bû, xwarina xwe ji mal dianî. Ji bo ku jehrê nedin wî. Bi tenêya serê xwe li balafiran siwar dibû, li keştiyan siwar dibû û netirsîna xwe şanî wan dida. Mustafa Balbay, di nivîsên xwe yên rojane de, dibêje; "Em 99 in, ew yek e. Ew ê li hemberî me bikaribe çi bike, xwe li ber me nagire." Her kes li dijî Hilmî Ozkok bû. Hilmî Ozkok, tenê bû. Heman tişt li hemberî Mustafa Kemal jî kirin pratîkê. Ew jî tenê bû. Helwesta Hilmî Ozkok, mîrateya 60 salan a darbeyên leşkerî têk bir. Hilmî Ozkok, digot, "Pêwîst e siyaset rola xwe bilîze." Digot, ez destûrê nadim ku artêş bikeve nava siyasetê. Hilmî Ozkok, dixwest bêje ku, pêwîst e hiqûq û siyaset rola xwe bilîze. Cudatiya artêş û siyasetê dianî ziman. Mustafa Kemal jî, siyaset û artêş ji hev cuda kiribû."

**AKP'ê îstîsmariya Ozkok kiriye**

Ocalan, got 'lê siyasetê rola xwe nelîst' û AKP'ê di 5 salên pêşî de, ji vê helwesta Ozkok îstismar kiriye. Ocalan, wiha axivî: "AKP'ê di 5 salên destpêkê de sûdewariyek mezin ji helwesta Hilmî Ozkok girt û ew îstîsmar kir. Lê dema ku Ergenekonê dest avête wî, çû Amerîka, çû vir û dera din. Alîkarî xwest. Piştre, bi ser Ergenekonê de çû. Gotinên Karadayi hene. Dibêje; "Min desthilatdarî li ser sifreya zêr danî û li ber Mesut Yilmaz danî. Lê baş bi kar neanî". Di heman rengî de, Kivrikoglu jî, heman tişt ji bo Ecevît pêk anî. Karadayi û Kivrikoglu jî gelek tişt dizanîbûn. Wan jî dixwest ku gav bêne avêtin. Ew, berî Hilmî Ozkok bûn. Eger ev hewldanên wan nebûna, rê venekiribûna, Hilmî Ozkok jî nikaribû bi vî rengî hereket bike."



**Komkujiya Zanqirtê tijî ders in**

Ocalan, di vê hevdîtina xwe de jî bal kişand ser komkujiya li gundê Zanqirtê û got kesên dixwazin ji gundê Zanqirtê fêm bikin tijî ders tê de hene. Ocalan, wiha axivî: "Bûyera gundê Zanqirtê, ji bo kesên bixwazin rastiyê fêm bikin, bi dersên girîng dagirtî ne. Bûyera gundê Zanqirtê, kiryara kes û derdorên ku naxwazin pirsgirêk çareser bibe bû. Kiryara Ergenekonê ye. Ev enî, xwe bi vî rengî nîşan didin.

HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti. Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
Adres:
Kooperatif Mahallesi
Gevran Caddesi 1 Geçit.
Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis
Yenişehir - Diyarbakır
TEL: 0 (412) 229 00 30
Fax: 0 (412) 229 00 39

Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece
İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad. No: 44 Seyhan
Edene
Yayın Türü: Süreli

# Hem diz in hem jî topiz in!

## Li navçeya Elkê cerdavanên ku êrîşî DTP'iyan kirin, piştre jî der barê wan de gilî kirin. Ligel van kirinên cerdevanan Dozgeriya Komarê li şûna ku der barê cerdevanan lêpirsînê bide destpêkirin, der barê DTP'iyan de lêpirsîn da vekirin

Li navçeya Elkê ya Şirnexê piştî ku sercerdevan Reşît Durmuş û hin cerdevanên din êrîşî DTP'iyan kiribûn, li ser giliyê cerdevanan der heqê DTP'iyan de lêpirsîn hate vekirin. DTP'iyan dan zanîn lêpirsîna der barê wan de hatiye vekirin bi temamî derhiqûqiye, di bûyerê de mexdûr bûne û dan zanîn piştî vê mexdûriyetê jî bi awayekî trajîkomîk der heqê wan de gilî bûye.

Li navçeya Elkê êvara hilbijartinê sercerdevan Reşît Durmuş û hevalên wî yên cerdevan piştî DTP'ê hilbijartin qezenc kir êrîşî avahiya partiyê û malên DTP'iyan kiribûn. Di bûyeran di xisara madî pêk hatibû û gelek kes birîndar bibûn. Tevî ku di ser bûyerê de 2 sal derbas bûne, ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Elkê ve tu lêpirsîn nehate vekirin. Cerdevanên ku hefteya borî dîsa êrîş kirin, derbarê DTP'iyan de li Dozgeriya Komarê gilî kirin. A. Kerim Ataman, da zanîn ku 3 hefte berê dema bi hevalên xwe re li ber qahwexaneyê rûdinişt sercerdevan Durmuş û xizmên wî êrîş wan kirine û diyar kir ku tenê ji bo navê wan di çapemeniyê de cih girtiye rastî êrîşê hatine. Ataman, da zanîn di dema êrîşê de polîsan mudaxele nekiriye heta piştgiriyî daye êrîşê û destnîşan kir ku piştî bûyera qewimî cerdevanan li dozgeriyê der heqê wan de gilî kiriye. Ataman, daxuyand ku tevî ew bi xwe mexdûr bûne der barê wan de gilî bûye û bi lêv kir ku Serdozgeriya Komarê gilî qebûl kiriye û der barê wan de lêpirsîn daye destpêkirin. Ataman ku da zanîn wekî partiyiyan bi hîstiyarî nêzîk bûne, diyar kir ku ji ber vê yekê derheqê cerdevanan de gilî nekirine û destnîşan kir ku tevî vê yekê li ser giliyê cerdevanan dozgeriyê derbarê wan de lêpirsîn daye destpêkirin.

**2 caran mexdûr bûn**

Ataman, da zanîn tiştên hatine jiyîn derhiqûqî e û diyar kir ku li gel ku mafdar bûn ew anîne reşxek sûcdar. Ataman, daxuyand ku li navçeyê her tim bêhiqûqî hene û bal kişand ku hemû saziyên dewletê jî dibin hevparê vê bêhiqûqiyê. Ataman, da zanîn wekî dema berê niha jî dewlet hewl dide cerdevanan bi sûcên wan re biparêze û wiha got: "Serdozgeriya Komarê ya Elkê alî digire. Şeva hilbijartinê dema cerdevanan êrîşî me kir me li dozgeriyê gilî kir. Lê tevî ku di navberê de 2 meh derbas bûn hîn ne doz ne jî lêpirsîn nehatiye vekirin. Dema rewş wiha be cerdevan dîsa êrîşî me dikin. Dema derheqê wan de doz bê vekirin dê carek din tiştek wiha nekin. Ji ber zanin tiştek bi wan nabe êrîşî me dikin. Û piştre jî diçin gilî dikin. Ev rewşek sosret e. Hem êrîşî me dikin û piştre jî debarê me de lêpirsîn tê vekirin."

**'Dixwazin li navçeyê kaosê derxin'**

Ataman, derbirî ku li navçeyê ji hilbijartina herêmî heta niha hewl tê dayîn rewşek kaosê bê derxistin û wiha dom kir: "Em ditirsin ku encamên hîn girantir derkevin holê. Cerdevan ji çekên dewletê hêzê digirin. Dewlet jî li hemberî tiştên tên jiyîn bêdeng dimîne û heta alî digire. Li herêmê cerdevan hemû karên qirêj dikin. Divê pergala cerdevaniyê zûtirî demê bi dawî bibe." **ŞIRNEX / DÎHA**



## Bi hezaran kes çûn konên sersaxiyê

Konên sersexayê yên ku ji bo gerîlayên HPG'ê yên ku li Licê û Mûşê di pevçûnan de jiyana xwe dest dabûn hatine vekirin ji aliyê hezaran kesan ve tên ziyaretkirin.

Parlamenterê DTP'ê Hatîm Geylanî, rêveberê Navenda Giştî yê DTP'ê Salîh Yildiz, Endamên Însiyatîfa Dayîkên Aştiyê, Şaredarê Bajêrgehê Hurşît Altekîn, Endamên Meclîsa Şaredariyê, Sarokê DTP'a Geverê Arîf Karay, rêveberên DTP'a Geverê, endamên YDG-M'ê, endamên Komeleya Welatiyên Azad, endamên KESK; DÎSK; DÎVES'ê jî di nav de bi hezaran kes çûn serdana konê sersaxiyê ya li gundê Garê ya bi ser Şemzînanê ji bo gerîlaya HPG'ê Leyla Şavli hatiye vekirin.

**'Bila baş nêzîkî vê şansê bibin'**

Di konê sersaxiyê de parlamenterê DTP'ê Hamît Geylanî axivî û bal kişand li ser biryara bêpevçûnê ku dê di 1'ê hezîrênê de bi dawî bibe û xwest ku hikûmet û Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan baş nêzîkî vê şansê bibe. Geylanî wiha axivî: "Di nava meheke de 30 gerîla û ji 30'î zêdetir leşkeran jiyana xwe ji dest da. Di nava meheke de dewletê li çiya bombe barand. Hikûmet û Serokwezîrê ku vê pêvajoya bêpevçûnê baş nanirxîne tenê bi çend gotinên Serokomar ve dixwazin derbas bikin." Geylanî got ku gelê kurd dê piştî 1'ê hezîranê jî xwedî li şehîdên xwe û nirxên xwe derkeve û axaftina xwe wiha domand: "Di pirsgirêka kurd de muxabatê esasî bênîqaş birêz Abdullah Ocalan e. Divê ev yek baş bê zanîn. Li cîhanê kîjan gelan ligel ku canê xwe dide axê lê dîsa jî aştiyê dixwaze. Kîjan gel ligel windayên xwe biratiyê dixwaze. Werin daxwezên dayik û bavên vê gelî yên biqîmet bi cih bînin. Destên wan ên aştiyê bigirin û bersiveke êrênî bidin. Piştî axaftina Geylanî bavê Leyla Şavli, Abdurrahman Şavli jî axivî û got ku keça wî şehîda gelê kurd e û bila serê gelê kurd sax be.

**'Bila cenezeyan bimin me'**

Li navçeya Gever a Colemêrgê jî konê sersaxiyê yê ji bo gerîlayê HPG'ê Abdulganî Uyar hatibû vekirin jî ji aliyê hezara kesan ve hate ziyaretkirin. Parlamenter, şaredar jî di nav de gelek kes çûn konê sersaxiyê. Dayika Abdulganî Uyar, Emîne Uyar spasiya xwe li kesên hatiye kir û got ku wê hate niha 3 zarokên xwe di têkoşîna azadiyê de daye. Emîne Uyar xwest aştî pêk bê û wiha axivî: "Di vî şerî de 3 zarokên min şehîd ket. Ew şervanên azadiyê û parazvanên mazlûman e. Ez li vir bang li dewletê dikim bila cenazeyên şehîdên min bidin min. Di rayedarên wî dewletê de mirovahî û misilmantî qediyaye."

Li aliyê din li navçeya Patnosa Agiriyê û Melazgira Mûşê jî konên sersaxiyê yên ji bo gerîlayên HPG'ê Îkram Kalbîşen û Tayfur Ogur konên sersaxiyê hatibû vekirin ji aliyê hezaran kesan ve tên ziyaretkirin. **COLEMÊRG**

## 42 sal ceza hate xwestin

**STENBOL**

Der barê Sabrî Denîz ê ku bi îdiaya 11 wesayîtên tu yên polîsan jî di nav de hene şewitandiye dozger heta 42 salan ceza xwest. Di danişîna ku li 9'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê hati dîtin de Sabrî Denîz û parêzerê wî amade bû. Dozgerê Komarê Selîm Berna Altay di danişînê de mutalaya xwe aşkera kir. Dozger îdia kir ku Sabrî Denîz beprpirsyarê şewitandina 11 wesayîtên tu di nav de 3 wesayîtên polîsan jî hene ye. Di mutalaya dozger de tê xwestin ku Sabrî Denîz ji endamtiya PKK'ê, 3 caran zirar dayîna malên kesan û 8 caran jî teşabbuskirina zirar dayîna malên kesan ji 9 salan heta 42 salan bê cezakirin. Sabrî Denîz jî di parasnameya xwe de sûc qebûl nekir û xwest ku bê berdan. Piştî parastinê ji bo ku ewraqên kêm bên temamkirin doz hate talûqkirin.

## Li Wanê 10 kes hatin binçavkirin

**WAN**

Di encama serdagirtina malan a li Taxa Xaçortê de 9 jê zarok 10 kes hatin binçavkirin. Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Wanê di seatên êvarê de li Taxa Xaçortê di ser gelek malan de girtin. Di serdagirtinan de 9 jê zarok bi tevahî 10 kes hatin binçavkirin. 10 kesên îfadeyên wan heta derengî şevê dom kir, serbest hatin berdan.

## Xwendekareke xwe kuşt!

**SÊRT**

Li navçeya misirca Sêrtê hate îdiakirin ku xwendekara lîseyê Evîn Polat (17) xwe kuştiye. Li gorî îdiayan Evîn Polat li mala xwe ya li taxa Bahçelîevlerê xwe daliqandiye. Der barê sedema "întiharkirina" Polat de agahî nehat girtin. Cenazeyê Polat ji bo otopsiyê rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Sêrtê. Piştî otopsiyê jî cenaze li Goristana Asrî ya Mircê hate defînkirin.

## Di qezaya trafîkê de 4 kes mirin

**AFYON**

Li Afyonê mînîbusek û taxsiyek li hev qelibîn. Di encama qezaya trafîkê de 4 kesan jiyana xwe ji dest da. Di qezayê de kesek jî birîndar bû. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin taxsiya aydî Omur Ekîcî, li ser riya Dazkiri û Denîzliyê bi mînîbusekê qelibî. Di qezayê de Sîbel Ekîcî, Nermîn Tulek, Omur Ekîcî û zarokê 23 rojî Bahtîyar Melîk Ekîcî li cihê bûyerê jiyana xwe ji dest da. Kesekî ku di qezayê de bigiranî birîndar bûye jî rakirin nexweşxaneyê.

## Li Serayê teqîn: Zarokek birîndar bû

Li navçeya Seraya Wanê zarokeke ku bi diya xwe re çûbû pincarê di encama teqînê de birîndar bû. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin li gundê Koçkirina Jurî ya bi ser navçeya Serayê zarokê bi navê Unal Demîr (13) bi diya xwe re çûye pinçarçinînê. Demîr dema ku pincar diçinî pêlî madeyeke teqemenî kiriye. Di encama teqînê de Demîr birîndar bûye û ew rakirine Nexweşxaneya Dewletê ya Serayê. **WAN**

## Li DTP'iyan lêpirsîn hate vekirin

Der barê rêveberên DTP'ê û Endamên Meclîsa Şaredariya Naçveya Bismila Amedê de ji ber ku tevli çalakiya protestokirina anîna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a Tirkiyeyê bûne lêpirsîn hate destpêkirin.

Pêkutiyên li hemberî rêveber û endamên DTP'ê bi dawî nabin. Her roj bi hincet û îdiayên cur bi cur der barê wan de doz û lêpirsîn têne vekirin. her wiha li aliyê din jî rastî êrîş cezayên giran tên. Dozgeriya Komarê ya Bismilê bi îdiaya ku di çalakiyên 15'ê Sibatê de sloganên ne qanûnî hatine avêtin der barê Serokê DTP'a Bismilê Hayde Ozalp, rêveberê DTP'ê Yemlîhan Erdem, Serokê Komeleya Çand û Hunerê ya Bismilê Suleyman Bakir, Endama Meslîsa Giştî ya Bajar Emîne Ozer û Endamê Meclîsa Şaredariya Bismilê Bahrî Erdem de lêpirsîn da destpêkirin. Di çarçoveya lêpirsînê de kesên navborî çûn emniyetê û îfade dan. **AMED**

## Li Amedê sewqiyata leşkerî

Li Kurdistanê operasyonên Artêşa Tirk didome. Li Amedê gelek tank û wesayîtên bi zirx ber bi Farqînê ve hatin sewqkirin. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin ji 7'emîn Fermandariya Qolordiya Amedê gelek wesayîtên leşkerî ber bi navçeya Farqînê hatin sawqkirin. Her wiha hate hînbûn ku dema sewqiyatê de tedbîrên berfireh hatin girtin û wesayîtên ku hatine şandin jî dê di operasyonan de bên bikaranîn. **AMED**

# Turk: Bi qasî PKK'ê hesas tevbigerin

**Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk anî ziman ku PKK'ê ji bo çareseriyê pêşniyarên şênber kirine û yên ku nêrîn an jî pêşniyereke wan a cuda heye, bila bibêjin û dewlet divê bi qasî PKK'ê hesas tevbigere**

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk diyar kir ku yên pêşniyara çareseriya PKK'ê qebûl nakin bila alternatîfa xwe danên holê û wiha got: "PKK'ê Îmralî, PKK, DTP û mirovên zana wekî alternatîfa pêşniyar kirin. Ev samîmiyeta PKK'ê nîşan dide. Yên van qebûl nakin bila alternatîfa xwe danên holê." Turk bang li kurdan jî kir xwest ku ji kîjan ramanê bibe bila bibe, divê herkes di vê pêvajoyê de li cem kesên ji bo azadî û demokrasiyê têdikoşin cih bigirin.

Turk derbirî ku pirsgirêk bi çekan nayê çareserkirin û wiha pêde çû: "PKK dixwaze di nav Tirkiyeyê de pirsgirêkê çareser bike. Rayagiştî jî daxwazên kurdan rewa, maqûl û di cih de dîtin. Ev yek dibe wesîleya hêviya çareseriyê jî. Lazim e riya diyalogê bê vekirin. Hêvî û firsetên nû hene. Ji bo çareseriyê pêvajo gihiştiyê lê îradeya aştiyê pêk bîne kêm e." Turk diyar kir ku di nav dewletê de jî cudahî hene û wiha domand. "Sazî û hêzên cuda hene. Nêrînên cuda jî derdikevin holê. Ji bo çareseriyê tiştên bên kirin hene. Lazim e pirsgirêk bê rojeva Meclisê. Lazim e ev firset ji dest neyê kirin. Lê mixabin niha mantiq, qadro û partiyên siyasî yên ji vê ferasetê dûr hene."

**'Daxwaz mafên kolektîf in'**

Turk diyar kir ku di nav saziyên dewletê de hemfikirînek nîn e û wiha domand: "Ligel di helwesta leşkeran de guherîn hebe jî, hêj li astek bê qebûl kirin nîne. Caran leşker behsa mafên keseyî dikin. Lê tê zanîn ku kurd li erdnîgariyekê dijîn û li vê erdnîgariyê jî pir zêde ne. Ji ber vê yekê mafên keseyî nabe. Lazim e mafên kolektîf bin. Ji bo mafê di cih de xwe rêvebirinê helwesta wan çiye? Nêzîkatiya wan a li hemberî projeya me ya xweseriya demokratîk çiye? Çareseriya pirsgirêkê jî nayê taloq kirin êdî. Ji xwe şerê 30 salan nîşan daye ku PKK nehate tasfiyekirin û nayê tasfiyekirin jî. Ku mesel li ser tasfiyekirina PKK'ê bê avakirin, kurd û tirk dê bên astek zêdetir mirov ji nav dernekeve. Lazim a formulek din bê peydakirin."

Turk, anî ziman ku ji bo çareseriyê jidilî lazim e. Turk, diyar kir ku PKK ji bo çareseriyê, "Îmralî, PKK, DTP û mirovên zana" 4 riyan dide pêş Tirkiyeyê û ev rê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd jidiliya PKK'ê dide nîşan.

Turk, anî ziman ku ew ne heyranê dîtina Serokwezîrin û ji bo ew pirsgirêkê bê xwîn çareser bikin dixwazin bi Serokwezîr re hevdîtinê çêkin. Turk, wiha axivî: "Em ne aşiqê dîtina Serokwesîrin. Li Tirkiyeyê xwîn dirje. Ji bo em rijandina xwînê rawestînin em dixwazin pirsgirêke bi riyên aştiyane çareser bikin. Ev yek jî bi dîyalogê pêk tê. Ger ku Serokwezîr me qebûl neke, tê wateya ku kurdan jî qebûl nake. Tê wateya ku naxwaze pirsgirêka kurd çareser bibe."

Turk, diyar kir ku PKK dê heta 1'ê Hezîranê pêvajoya bêçalakiyê bi dawî bike û axaftina xwe wiha dom kir: "Li gorî nerîna me divê ev pêvajoya bêçalakiyê bidome. Ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan projeyên xwe yên çareseriyê pêşkêş bike, divê heta 1'ê îlonê ev pevajo bê dirêj kirin. Divê ji bo çareseriyê û aştiyê ev pêvajoya heta îlonê dirêj bibe û her kes piştgiriyê bidin vê pêvajoyê."

Turk, bal kişand ser operasyonan û destnîşan kir ku operasyon pêvajoya aştiyê dixe xeterê. Turk, anî ziman ku operasyon bidomînin, dirêjkirina beçalakiyê zahmet dibe. Turk, anî ziman ku li gel biryara PKK'ê ya bêçakakiyê operasyon zêde bûne û saziyên demokratîk ên Tirkiyeyê li hemberî vê yekê bertekên lawaz nîşan dane. Turk, ji saziyên demokratîk xwest ku li hemberî operasyonan dengê xwe berz bikin û seknek xurd bidin nîşan.

**Banga yekitiyê kir**

Turk, bilêv kir ku pewîste ku hemu kurd piştgiriyê bidin vê pêvajoyê û got ku fikra wî çi be bila bibe di vê pêvajoyê de hemû kurd piştgiriyê bidin DTP'ê. Turk, ev tişt gotin: "Ya girîng ew e ku di vê demê de hemû gelê me bibe yek. Divê hemû kurd piştgiriyê bidin me. Eger ez îro ne DTP'î jî bam dîsa min dê piştgirî daba vê pêvajoya aştiyê. Loma gelê me li benda aştiyek bi rûmete. Ji bo vê peywir dikeve li ser milê hemû kesî. Me heta niha gelek bedela dane. Bila gelê me xwedî li vê pêvajoyê derkeve." **ENQERE / DÎHA**



## Em di helwesta xwe de bibiryar in

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, li hemberî gotinên Serokê Meclîsê Koksal Toptan yên wekî "Hewceyî bi xwe mezinkirinê tune ye lazim e her kes biçe îfade bide" nerazîbûn nîşan da. Turk wiha got: "Em her tim li hemberî xwe mezinkirinê û zordariyê sekinîne. Niha jî em li dijî bêhiqûqiyê disekinin. Em ê vê helwestê bidomînin."

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, di vekirina "Buroya Rêveberiyên Herêmî û Ekolojiyê" de axivî û bersiv da Serokê Meclîsê Koksal Toptan ku gotibû, "Hewceyî bi xwe mezinkirinê tune ye lazim e her kes biçe îfade bide." Turk, wiha axivî: "Toptan dibêje 'Hewceyî bi xwe mezinkirinê tune ye lazim e her kes biçe îfade bide'. Behsa sûcên li hemberî yekitiya welat û madeya 14'ê ya Makezagonê dike. Em li vî welatî piştgiriyê didin feraseta çareseriyê. Li hemberî me cudakarî tê bikaranîn. Heta niha ji vî madeyî tu parlamenter nehatine darizandin. Ev yek bêhiqûqî ye. Em di helwesta xwe de xwedî biryar in." **AMED**

# Rêziknameya DTP'ê kirin delîlê sûc

**NAVENDA NÛÇEYAN** AMED

Serdozgeriya Komarê ya Amedê pêr îdianameya der barê DTP'iyan de aşkera kir. Derket holê ku dozgêr ji ber faaliyetên DTP'ê û terzê xwerêxistinkirina partiyê operasyona li hemberî DTP'iyan daye destpêkirin. Ji îdianameyê jî dixuyê ku rêziknameya DTP'ê wekî sûc hatiye dîtin. Lewre sûcên ji bo DTP'iyan hatine rêzkirin, hemû faaliyetên DTP'ê yên di çarçoveya rêziknameyê de hatine kirin in.

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna piştî operasyona 14'ê nîsanê dabû destpêkirin anî bû ziman ku armanca vê operasyonê terzê demokratîk ê xwerêxistinkirinê yê DTP'ê ye. Ayna piştre jî di civîna Koma Parlamentoyê ya partiyê de xîtabî komê kiribû û gotibû, heke ev kirinên wekî hincet hatine nîşandan sûc bin, em jî wî sûcî pêk tînin.

**Rêxistinbûna DTP'ê...**

Di îdianameya DTP'iyan a ku ji 148 rûpelan pêk tê ku ji aliyê 6'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê ve pêr hate qebûlkirin, kirinên ku wekî sûc hatine nîşandan; piraniya wan kirinên di çarçoveya rêziknameya partiyê de ne.

Piraniya delîlên 'sûc' ên ji bo DTP'iyan hatine rêzkirin, ji guhdarîkirina telefonan û guhdarîkirina derûdorê hatine girtin. Hemû axaftinên DTP'iyan ên di navbera xwe de û e-mailên wan wekî sûc hatine dîtin.

Yek ji 'delîlên sûc' ên di îdianameyê de hatiye dayîn axaftinên bi telefonê yên ligel Nûnêrê DTP'ê yê Bûroya Karûbarên Derve yê Ewropayê û Şêwirmendê Siyasî yê Navenda Giştî Sabrî Ok re ne. Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna di parlamentoyê de têkiliya fermî ya partiyê ya bi Sabrî Ok re anî ziman û got: "Ez jî gelek caran bi riya telefonê bi Sabrî Ok re axivî me."

Delîlekî din ê 'sûc' Konferansa Civaka Demokratîk ku di 3-5'ê mijdara 2006'ê de li Stenbolê pêk hatibû û ligel ku polîsan di ser konferansê de girtibû jî tu delîlên derqanûnî bi dest nexistibûn. DTP'ê ji vê dîrokê şûn de du caran bi navê Kongreya Civaka Demokratîk li Amedê civîn li dar xistin û herî dawî Belgeya Siyasetê ya di encama kongreyê de hatiye qebûlkirin bi raya giştî re parve kir û DTP'ê di kongreya xwe ya dawî de Belgeya Siyasî ya Kongreya Civaka Demokratîk, erê kir.

'Sûcekî' din ê di îdianameyê de hatiye dayîn pêşniyara DTP'ê ya ji bo Xweseriya Demokratîk e. DTP'ê di belgeyê de pêşniyara pergala konfederal kiri bû. Di îdianameyê de ev belgeya DTP'ê ku heta niha di her qademeyê de DTP'iyan bi raya giştî re parvekiriye wekî daneyeke rêxistina derqanûnî hatiye nîşandan.

**Meclîsên bajaran jî 'sûc' in**

Di îdianameyê de yekûyeko tê dîtin ku Serdozgereyê rêziknameya DTP'ê wekî 'delîlê sûc' nîşan daye. Lewre yek ji hincetên operasyon û dozlêvekirina li DTP'iyan jî terzê xwerêxistinkirinê yê DTP'ê ye. Meclîsên bajar, navçe, bajarok, meclîsên jinan û meclîsên ciwanan wekî sûc hatine dîtin. Bi vê mebestê hatiye xwestin ku DTP'î wekî derqanûnî bên nîşan dan.

Di Benda b ya Xala 4'ê ya Rêziknameya DTP'ê terzê xwerêxistinkirinê yê partiyê vegotiye û hatiye destnîşankirin ku di çarçoveya vê xalê de li ser esasê avakirina meclîsan dê DTP xwe birêxistin bike. Ev rêziknameya DTP'ê ji aliyê Wezareta Karên Hundir ve dema partî hatiye avakirin, erê bûye. Xala 15'mîn a rêziknameyê yek bi yek terzê xwerêxistinkirinê yê partiyê hatiye vegotin. Li gorî vê yekê DTP rêxistinbûna xwe di çarçoveya kongre, serokatî, lijneya rêveber, meclisa şêwirmendiyê, meclisa jinan û meclisa ciwanan de pêk tîne. Balkêş e ku di îdianameya DTP'iyan de ev jî wekî sûc hatiye dîtin.

# Di 1'ê hezîranê de aşkera dikin

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê, der heqê gotûbêjên li ser bûyera li Çelê ku di encamê de 7 leşkerên tirk hatin kuştin de, daxuyaniyek da çapemeniyê. Birayra bêçalakîbûnê di 1'ê hezîranê de di ber çavan re tê derbas kirin.

Serokatiya Konseya Rêveber bi bîr xist, ku tevgera wan herî dawî di 23'ê gulanê de ji bo rawestandina operasyonan hişyarî dabû û destnîşan kiribû ku piştî vê banga wan ji windahiyên ji ber operasyonan rû bidin, ew ê ne berpirsyar bin. KCK'ê diyar kir, ku di dewsa hişyariya wan li ber çavan were girtin de, operasyonên li dijî gerîlayên di rewşa bêçalakiyan dene operasyon hatine şidandin û ji ber vê yekê wendahiyên giran rû dane.

**'Em ne berpirsiyar in'**

KCK'ê destnîşan kir, ku tevî 6 leşkerên li Çelê hatin kuştin, yekane berpirsiyarê windahiyan Serfermandariya Giştî ya Artêşa Tirk û Hikûmeta Komara Tirkiyê ye, ku artêşa xwe dişîne ser gerîlayên di pozîsyona bêçalakiyan de ne.

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê da xuyakirin, ku bi van êrişan re tê xwestin, muxatabê çareseriyê ji holê bê rakirin û pêvajo bê sabotekirin.

KCK'ê, operasyona li dijî sendîkayan û îdianameya der heqê DTP'iyan de jî bi bîr xist û destnîşan kir ku ev hemû ji bo tunekirine kurdê azad ê li qada siyasetê tê kirin û ev yekê ji aliyê gelê kurd ve ti carî neyê qebûlkirin.Di dewama daxuyaniya KCK'ê de weha hat gotin: "Namertî, ne mirina kesên ji bo kuştinê bi ser mirovan de diçe ye, namertî, êrişa li dijî mirovên di rewşa bêçalakiyan de ye."

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bibîr xist, ku ji roja îlankirina rewşa bêçalakiyan heta îro, tevî fermandarên gerîla nêzî 30 lehengên gelê kurd jiyana xwe ji dest dane û ev xal destnîşan kir: "Derdorên siyasî û saziyên çapemenî-ragihandinê qet pêwistî nedîtine ji dewletê bipirse, ka çima bi ser gerîlayên di rewşa bêçalakiyan de ye, diçe. Bi xwe re nedîtiye, ku bifikire ka şahadeta 30 gerîlayan ji bo gelê kurd tê çi wateyê? Di vê mijarê de hişyariyeke biçûk jî nedane. Ji aliyê din ve, bi mirina 6 leşkeran re tofanê radikin."

**Kuştina kurdan rewa tê dîtin**

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê da xuyakirin, ku ev yek tê wateya, 'Ez ê te bikujim, ev mafê min ê xwezayî ye, lê belê eger tu xwe biparêzî, tu destê xwe rakî, hingî ez ê cîhanê bi serê te de bînim xwarê.' KCK'ê destnîşan kir, ku divê baş bê zanîn her zindî û mirovên li ser erdnîgariyê dizane xwe biparêze û mafê parastina rewa mafê herî pîroz e. KCK'ê xemgîniya xwe ya ji ber windahiyan anî ziman û diyar kir, ku birpirsyarê van wendahiyan, hêzên biryara operasyonan didin e. Serokatiya Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê, 2 roj beriya 1'ê Hezîranê (duh), careke din banga berpirsyariyê li hemû hêzan kir.


KCK'ê anî ziman ku ew ê di 1'ê hezîranê de biryara xwe ya ji bo rewşa bêçalakîbûnê biryara xwe aşkera bikin. **BEHDÎNAN / ANF**

# 'Em naxwazin cardin hêviya aştiyê bişikê'

Ji Sekreteryaya Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê Dr. Mettîn Bakkalci diyar kir ku lazim e KCK biryara bêpeçûntiyê ya heta 1'ê hezîranê dirêj bike û wiha got: "Em naxwazin cardin hêviyên me yên aştiyê bişkên. Em dixwazin ji bo aştiyê helwestek samîmî derkeve holê."

Endamên Meclisa Aştiyê, Serokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan, Serokê TÎHV'ê yê berê Yavuz Onen, Sekreterê Giştî yê Komeleya Hevgirî û Çnadê ya Pîr Sultan Abdal Kazim Genç, Serokê Kurd-Der'ê Ahmet Aday, Berdevkê Hewildana 78'tiyan Huseyîn Gevher, gelek nivîskar, rewşenbîr û siyasetmedar beşdar bûn. Ji Sekreteryaya Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê Dr. Metîn Bakkalci diyar kir ku lazim e KCK biryara bêpeçûntiyê ya heta 1'ê hezîranê dirêj bike û wiha got: "Em naxwazin cardin hêviyên me yên aştiyê bişkên. Em dixwazin ji bo aştiyê helwestek samîmî derkeve holê." Bakkalci domandina operasyonan jî rexne kir û banga dawî lê anîna operasyonan kir. **ENQERE**

## 'Divê Ocalan û PKK bên dîtin'



**Parlamentera DTP'ê ya Amedê Aysel Tugluk anî ziman ku wan bi xewnekê dest pê kir û niha xewna wan vedigere rastiyê. Tugluk, bi bîr xist ku wan dest ji meşa xwe bernedaye û ji bo azadî û demokrasiyê meş û têkoşîna xwe dom dikin. Tugluk, bal kişand ser operasyon û pirsgirêka kurd û wiha dom kir: "Ji Serokomar heta Serokwezîr nîyetekê datînin holê. Lê belê di vê nîyeta xwe de çiwas ji dilin em nizanin. Ger ku li ser înkar û belavkirinê difikirin em vê yekê red dikin. Pirsgirêk bi înkar û tasvîyekirinê çareser nabe. Aliyê pirsgirêkê PKK ye, birêz Ocalan e. Divê PKK'ê û birêz Ocalan bibînin. Ji birêz Ocalan heta DTP'ê her kes muxatab e."** AMED

www.arsivakurdi.org

# Dengê efsanewî yê bilûrê 'Qalemere'

Dr. KAMURAN EMÎN AWÊ

Bêdengiyek giran derdora Kafeya Azerî, cihê kombûna ciwan û rewşenbîrên bajarê Bokanê dagirtibû, hemû di fikaran de bûn. Nêrînên bêhêvî û rûyên tingijî nîşana êşekê bû ku ser dilê wan giranî dikir. Kesek nedikarî weke her rojê biaxive û henekek rojane dubare bike. Xeleka dûkela cixareyan govend dikirin û çavên bê şewq û bêhêviya ciwanan nîşana qêrîna ji bê edaletî û guşara giran û serkuta hêzên komara îslamî bûn ku bi hatina xwe ya Kurdistanê xeyala dagirkirin û bidawî bûna bingeha kufrê dikirin... Nû gihiştiyên ku lazim bû bi riya sîleh û zincîran peyama cîhada îmamê xwe bigihînin gelê kurd û bi derbaskirina kal û ciwanan ji berê tîxê tovê tirs û bê hêvîtiyê di dilê wan de biçînin...

Li aliyê din ê kafeyê pîremêrek bi simbêlên tijî, rêdîna reng genimî û pişta nîvxar bûyî ji nava dûkel û bêhna cixareyan riya xwe ji bo vedîtina cihekî di quncika kafeyê de vedikir. Bi aramî li ser maseyekê rûnişt û li derdora xwe nêrî. Wî atmosfera girana kafeyê bi temamî his dikir, ew cara yekê bû ku wan ciwanan atmosferek wiha tecrûbe dikirin, lê sînga wî ji bîranîn û bûyerên xembar ên berê pir bû. Dilê wî hê giraniya têkçûna komara Kurdistanê û dardekirina pêşewayê kurdan û hevalên wî ji bîr nekiribû. Fikra ji dest dayina "Silêman Muînî, Îsmaîl Şerîfzade, Ehmed Şelmaşî û Mehmûd Zengene" birînên dilê wî kûrtir dikirin, jixwe fikirî gelo ez ê dîsa şahidê ji destçûna zarokên welatê xwe bi destê warisên tac û texta şîra keska îslamê bibim. Wî qet lihevhatina bi dijminê xwînrij qebûl nedikir, ew ji bindestî û bê hêvîtiyê bêzar bû...

Lazime mirov ji bo pêşerojê bi hêvî be, heta roja ku li wî welatî dayik hebin ku di hembêza xwe da "Ezîz Yusif'î" yan perwerde bikin û heta roja ku zarokên wî welatî agirê sorê serhildanê li bilindahiya çiyayên Kurdistanê pêxistî hilgirin lazim e mirov ji bo pêşerojê bi hêvî be. Piştî wan fikaran Kalemêr dîsa li derdora xwe nêrî û bi aramî bilûra xwe ku di nava destmalekê de verpêçabû derxist, qirika xwe paqij kir û hêdî deng ji bilûra di destên wî de derket, dengek efsanewî ku dixwest pêxemberê hêviyê be. Dixwest biqîre û şewqa şahî û hêviyê di dilan de bi cîh bike. Bilûra wî bi zimanekî din dipeyivî. Wî pêştir şahrezatiya xwe di vexwendina melodiyên klasîk ên kurdî û ayetên Quranê bi bilûra xwe nîşan dabû, wê carê bi marşa neteweyî ya kurdan dixwest hunera xwe bigihîne asta herî bilind.

***"Ey reqîb her mawe qewmî kurd zuban***
***Nay rimênê daneyî topî zeman***
***Kes nelê kurd mirdûwe kurd zinûwe***
***Zîndzûwe hîç nanewê alakeman"...***

Bi her dengê ku ji bilûrê derdiket tevahiya laşê bîseran ketibû govendê, xwînek nû û ruhek taze di canê wan de cih girtibû. Wî bi bilûra xwe mizgîna pêşerojên baştir û geştir dida. Werbêjî ku bilûra wî bang dike:

***"Dizanin zamî dîlî çend be êş û çend be azare!***
***Debê rabîn heta êmeş degeyne rêzî serbestan***
***Heta kengî eşkî xwênînî kiçe kurdî bira kujraw***
***Le cêy badew le bezmî dijminan bidrête des mestan***
***Sehulbendanî bîdadî eger tûş û dijware***
***Belam lêm sûre wek rojê, behar her dê le dûy zistan***
***Be xelkî alemî selmanduwe tarîxî azadî***
***Debê zalim leber têkoşeran berdatewe destan"*** [(1)]



Dengê ilahî û dilnişînê bilûrê ji sîlehên dijmin gelek bihêztir bû û atmosfêra hişk, tezî û bê ruha kafeyê bi yêkcarî guherand, hêz û evînek nû da mêvanên kafeyê, hêza ku lazime ciwanan ber bi pêşeroj û asoyên geştir bibe. Pêşeroja ku ji bo gihîştina wê pêwîstî bi fedakarî, kişandina êş, azar û şahrezatî di riyek pir bi evraz û nişîv heye.

Mamosta "Qadir Ebdullahzade" yê meşhûr bi navê Qalemere di zivistana 1925'an de li gundê Kulîce, ya bi ser bajarê Bokanê hat dinê. Ew di destpêka zarokatiya xwe bi ji dest dayina dê û babê xwe sêvî ma, ji bo debara jiyana xwe rastî gelek nebaşî û zehmetiyan hat. Di 11 saliya xwe de dest bi lêxistina bilûrê kir û ji wê rojê şûn de ji bo demekê jî bilûra xwe ya hesinî û reng zer ji xwe dûr nexist. Bilûra wî tenê emrazek ji bo xweşî û pir kirina demên betaliyê nebû, lazim bû ew li kuçe, bazar, kafe û cihên pir hat û çûyên bajêr de beşek ji xerca jiyana xwe ya rojane peyda bike. Ger bi destê çerxa felekê qedera jiyana wî li welatekî din ba jiyana wî rengekî din digirt, lê lazim bû ew ji bo bidestxistina pariyek nan berê xwe bide karkerî, şivantî û... û bi ilham wergirtin ji xaka dêrîna bab û kalên xwe, qehremanên navdar û bênavên Kurdistana mezin. Xwezaya wê ya bedew û bêrehm xweştirîn muzîkên millî biafirîne. Sînga wî pir bû ji êş û dîroka zindiya miletekî ku ji bo bidestxistina mafê xwe bi hezaran zarokên xwe fedayî wê riya bi şan û şeref kiriye û her çiya, ber, dar, newal û deştên welatê wî şahidê qehremantiya serbazên bênav û nîşanên welatê wî ne.

Wî zêdetir ji destana "Kanebî" ku behsa şerê gundiyekî bi navê "Kanebî Fiqeweys" bi yek ji xanên Meraxê û mirina trajîka wî dike hez dikir. Ew yek ji wan karên wî bû ku di mîhrîcana gelan a 1979'an de, ku ji aliyê rêxistina "Çirîkên Fedaiyên Gel" hatibû lidarxistin li bajarên Bokan, Mehabad û Sinê hat pêşkêşkirin. Mamosta Ebdullahzade ji wan hunermendan bû ku hunera xwe di xizmeta daxwaz û ramanên xwe yên millî pêşkêşî gel kirin, û di dirêjiya jiyana xwe ya pir bi evraz û nişîv de ne tenê ji aliyê dijminan, belkî ji aliyê hevalên xwe yên nezan jî rastî gelek nebaşiyan hat. Wî digot û bêjek xwe bi werger û nivîskar Mihemed Remezanî da wiha gotibû: "***Ger min xwe daba destê hezên serdest niha ez xwedî hemû tiştî bûm***..." lê bilûr û hunera bilinda wî tenê di xizmeta kultur û gelê wî de bû, da ku ji bo bidest xistina pariyek nan xwe serşurê welatê xwe neke. Di heman gotûbêjê de banga wî ji bo kurdên derveyî welat ev e: ***"Kurdîtiya xwe berdewam bikin, pirtûka binivsînin... Bi hêviya xwedê em ê ji wê qedera reş rizgar bibin û bi dîtina hev li welatekî serbest şa bibin!!"*** Ew di wê baweriyê de bû ku bi mirina wî, dengê efsanewiyê bilûra wî jî wedimire. Wî wesiyet kiribû ku piştî wefata wî, take hevalê jiyana wî, bilûra zêrîna wî pêşkêşî muzexaneya bajarê Hewlêrê bikin. Apê me yê nemir Qalemere di 21'ê gulana 2009'an de li nexweşxaneya Qulî poûr li bajarê Bokanê çavên xwe ji jiyanê girtin...

***(1)*** *Beşek ji helbesta şairê milliyê Kurd " Hêmin Mukiryanî ".*

***Têbinî****: Ev babet di 23.05.2009'an de bi zimanê farisî di malpera* ***www.akhbar-rooz.com*** *de hatiye weşandin.*

***Wergera ji farisî:*** *Dêrsim Oremar*



## Tu carî ji bilûra xwe dûr neket

Mamosta "Qadir Ebdullahzade" yê meşhûr bi navê Qalemere di zivistana 1925'an de li gundê Kulîce, ya bi ser bajarê Bokanê hat dinê. Di 11 saliya xwe de dest bi lêxistina bilûrê kir û ji wê rojê şûn de ji bo demekê jî bilûra xwe ya hesinî û reng zer ji xwe dûr nexist.



yildizgultekin@hotmail.com
Yildiz GULTEKÎN

## Birincê Nazê

Min qet ji we re behsa Nazê nekir ne! Wîî ew bûkeke wisa baş e, wisa delal e, wisa maqûl e, ew destê xwe davêje çi, xwarin be, vexwarin be, nav malê paqijkirin be, di destê wê de dibe zêr. Gava birincê bêgoşt jî çêdike heta zikê me biteqe em zorê didine xwe û dixwin. Dema dilê min birinc bixwaze hema ez bi lez diçim ba Nazê, ew jî feqîrê wexta min dibîne ew dizane dilê min birinc dixwaze. Ez jî weke wê dikarim çêkim lê ew tam tê de tuneye. Seba vê yekê jî ez kengê herim çarşiyê Nazê tim di bîra min de ye û ez her carê tûrikek birinc ji wê re jî distînim.

Wê rojê ez, Porteqal, Hezarê, Çilgulî û hwd em çûne çarşiyê kêmasiyên xwe bistînin, me vir da wê da kêmasiyên xwe temam kir, dawiyê min çewalekî pênc kîlo birinc ji Nazê re ştand, em ketine ser rê û me berê xwe da malê. Wexta me riya xwe nêvî kir, em rastî Zenûra sergijik hatin, çend caran min jê re gotiye: Keçê tu jineke meşte mezin î, tu weke kerayî, ewqasî teral û bê emel nemîne, car caran serê xwe bişo, porê xwe şeh bike, bila xelk jî te bixe rêza jinan, her carê nabêje na, hema dibê wextê min tuneye, ez belengaz im, heta êvarê qet ez nikarim rûnêm û bêhna xwe bigirim, filan û bêvan.

Min got xwelî li serê te kim, vî halê te mêrê te çawa dikare li tev te razê? Wê go: Heeeey hûn hew mêrikê min nas nakin, dema dibe şev qet mecala wî namîne, hema çepilê min digire û kaşî nava cih dike, hem dikene, hem jî qala xwe û kirinên mêrikê xwe dike, hê çend saetan qala wan tiştan kir, min bala xwe dayê Porteqal û Hezarê jî ketine nava wan şêwrana, min dî feyde nake, min çepilê wan girt, hinekî hêrs bûm li wan.

Em çûne malê, hema ji dûr ve bêhna birincê Nazê kete nava bêvila me, dayê aqilê me ji serê me bir, heta em bi xwe hesiyan, em li ser şîva Nazê ne, feqîrê di mala wê de çi heye anî da ber me. Piştî xwarinê min got Nazê me efû bike, me nefsa xwe negirt û me birincê te jî xwar. Go qet ji min re van gilî gazinan nekin, her tim ez dixwazim ji we re birincî çêkim, dilê we kengê bixwaze ez amade me. Hate bîra min, keçê ne min ji te re çewalek birinc kirîbû, min li nava tûrik nêrî çewalê birinc tuneye...

HAWARA EYŞO

REMOYÊN NÛJEN




ŞÎROVEYA REMO






rizoxerzi@gmail.com
Rizoyê XERZÎ

## Dema kesekî ji bo çareseriyê tuneye

Dawî tirkan ji xwe re tiştek dîtin ku ji kesekî nedizîne govendek an jî rengekî dansê peyda kirine ku ew ji tu miletan nedizîne navê wê dansê kirine (Qolbastî). Yanî zîtirkên ji paş û pêş. Danseke pir serbest e û tiştek zêde ji hînbûna wê re navê. Hema tu zanî bî zîtirkan bidî bi hêsanî tu dikarî vê dansê hîn bibî.

Ev demeke ku media tirk hema bêje roj tuneye ku bi awayekî ji awayan behsa vê mijarê neke û bajarên Tirkiyeyê wey li wî ew dibêje ev hunera bi serê ecêban ya min e yê din bi sê telaqan sûnd dixwe ku ew huner ya bajarê wan e. Ez carina ji xwe re dibêjim "mala xwedê ava be ku yên tirkan jî wekî kurdan bi sedên rengê govend, dîlan û dansan tuneye" heke yê wan jî ewqas rengên cuda hebûna wê demê wê 24 saetan tenê behsa wan cureyên dîlanan kiribûna.

Di vê dema ku çavê cîhanê tevî li gavên berbiçav in ku ji alî Tirkiyeyê ve werin avêtin ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd em dibînin ku media tirkan serê xelkê xwe bi qolbasî mijûl dike. Heke media tirk bi qasî ku li ser qolbastî radiweste ewqasî li ser çareseriya pirsgirêka kurd rawestiya niha çareser bûbû.

Ne tenê tirk beşek mezin ji kurdên ku xwe wekî serbixwe binav dikin ew jî karekî wan ê din heye, ew jî bi lîstika Okey mijûl in dema wan tuneye ku li ser vê pisgirêkê rawestin û dema ku behsa pirsgirêka kurd tê kirin tenê karek wan heye ew jî rexne û êrîşên li ser tevgera kurd a azadîxwaz e. Piştî demeke dirêj ji bêhêvîtiyê dîsa gotinên Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul hin hêvî dan kurdan lê ji ber ku gelek caran ev soz û gotin tenê mane gotin û wekî ku dibêjin 'gotinên êvara ketin qulê dîwaran' yanî piştre xwedî li wan gotinan derneketine. Lewra jî kurd êdî di wê baweriyê de ne ku bi gotinên xweş ev pisgirêk çareser nabe û pêwîst e ku gavên berbiçav werin avêtin. Mixabin ku di vê dema nazik de tirk bi qolbastî daketine û kurd jî bi lîstika okey loma jî kesek vala tuneye û dema kesekî tuneye ku vê pirsgirêkê çareser bike. Loma rengê ava çemê Firatê her ku diçe sortir dibe, wekî çavê dayikên ku zarokên xwe yên ciwan dixin binê axa sar.

# Piştgiriya ji bo mitîngê didome

## Li Êlihê jinan di daxuyaniya xwe de diyar kir ku dê dengê xwe bikin yek û bibin hêza çareseriyê. Li Licêyê jî ji bo banga tevlêbûna mitînga jinê ya dê li Amedê bê lidarxistin belavok belav kirin

Endamên Meclîsa Jinan a DTP'a Êlihê bi daxuyaniyekê piştgirî dan mitînga ku li Amedê tê lidarxistin. Li Licê jî jinan ji bo tevlêbûna mitîngê belavok belav kirin û ji jinan piştgirî xwest.

Endamên Meclîsa Jinan a DTP'a Êlihê diyar kir ku dê piştgiriyê bidin mitînga 31'ê gulanê ya li Amedê pêk tê. Der barê mijarê de li avahiya DTP'ê ya bajar daxuyaniyek hate dayîn. Endama Meclîsa Jinan a DTP'ê Hulya Îpek daxuyanî da. Îpek di daxuyaniyê de bal kişand ser nîqaşên ku der barê pirsgirêka kurd de tên kirin. Îpek, diyar kir ku divê herî zêde jin der barê çareseriya pirsgirêkê de nêrînên xwe bînin ziman û wiha axaftina xwe dom kir: "Di şerê ku bi salan e dom dike de herî zêde jinan zirar dît. Li dijî serdestiyê, kuştin û qetlîamê divê nêrîna jinê ya di hêla aştî, çareserî û azadiyê bêtir derkeve holê." Îpek bal kişand ser mitînga ku dê 31'ê gulanê de pêk bê û got ku dê bi girseyî tevli mitîngê bibin û dengê xwe bikin yek. Îpek, daxuyand ku jin dê bibe hêza çareseriyê.

**Belavok belav kirin**

Her wiha li Licêya Amedê ji bo banga tevlêbûna mitînga jinê ya dê li Amedê bê lidarxistin belavok hatin belavkirin. Têkildarî mitînga jinê ya dê di 31'ê gulanê de li Amedê bê lidarxistin, li avahiya DTP'ê ya Licê civîn hate pêkanîn. Endamên Însiyatîfa Jinê ya Licê û Şaredara Licê Fîkriye Aytin jî di nav de gelek jin tevî civînê bûn.

Gulten Balkaş ku di civînê de li ser navê Însiyatîfa Jinê ya Licê axivî, bang li jinan kir ku tevî mitînga navborî bibin. Balkaş, bi bîr xist ku di demeke ku pirsgirêka kurd tê nîqaşkirin de dê roja yekşemê li Amedê meşeke girseyî li dar bixin. Her wiha jinan li navçeyê ji bo mitîngê belavok jî belav kirin. **AMED / ÊLIH**



Jinan ji bo banga tevlêbûna mitînga jinê ya dê li Amedê bê lidarxistin belavok belav kirin.

# Mosuo ji hêla jinan ve tê birêvebirin

Welatê Mosuoyê yê başûrê Çînê ji hêla jinan ve tê birêvebirin. Mosuoyê bi rêvebeRiya jinan li cîhanê dibe mînak. Li vî welatî asta şîdetê kêm bûye. Rojnameger û doktor Ricardo Colera arjîntînî 2 mehan ji bo lêkolînê li Mosuoyê ma. Li gorî rojnameger li vî welatî herî zêde gotinên jinan li pêş in.

Coler, lêkolîna xwe di pirtûkê de berhev kir. Rojnameger Coler, destnîşan kir ku welatê ku ji hêla jinan ve tê birêvebirin dê ji bo cîhanê bibe mînak. Li Mosuoyê jin bi hêz e û hêza xwe ji bo zêde qezençkirina pereyî serf nake û ji bo malbat û jiyaneke rihetir serf dike. Her wiha tişta herî berbiçav jî şîdet e ku li vî welatî nîn e. Her civakê pirsgirêk hene, lê vî welatî pirsgirêk tu carî bi şîdetê nayê çareserkirin. Hêrsbûn û tolhildan li gorî civaka Mosuoyê şerm tê nirxandin û her wiha statuya mirovan dixe xetereyê. Her wiha mêr hêrî zêde di karên fîzîkî de dixebitin. Dîsa li Mosuoyê şaredar mêr in. 25 hezar mirov li Mosuoyê dijîn. Ji bo Mosuoyê peyva bav bêwate ye. **PEKÎN**


# BÎRANÎN

*Pîroz dikim ez salvegera we*
*li ser sûkan seher xweş rewşa we*
*ji bo gelên xwe rêzaniya we*
*me navê te kola li ser dilê xwe*
*Hêvî Botan*

*Sed bawerim ez, demokrat in hûn*
*ji ber vê rewşê serfiraz in hûn*
*ji bo keç û lawan navnîşan in hûn*
*me navê te kola li ser dilê xwe*
*Hêvî Botan*

*Bi sûnd û peyman hûn ê bidomin*
*navend û navçeyan ciwan bixwînin*
*bi rewşenbîrî hûn dê biminin*
*me navê te kola li ser dilê xwe*
*Hêvî Botan*

*Ji bo civakê perwerde ne hûn*
*wan rûpelên we rêz bi rêz bixwînin*
*ronahî tê de her em dibînin*
*me navê te kola li ser dilê xwe*
*Hêvî Botan*



*Fatma Ozer*
*(Hêvî Botan)*
*1980 -2007*

*Her em bawerin hûn dê her hebin*
*astengî ji bo we êdî tune bin*
*hezkirina we her tim zêde be*
*me navê te kola li ser dilê xwe*
*Hêvî Botan*

**Li ser navê malbata wê Nacî û Ekrem**


# Dixwazin ew bi xwe namzetên jin diyar bikin

Rêxirawên jinan ên kurd bi sedema destnîşannekirina berendamên jin ji bo hilbijartinên parlamenê nêrîna wan li ber çav nagirin, gazinan ji hizban dikin û daxwaz dikin ku ew bi xwe namzetên jin destnîşan bikin.

Di hilbijartina rabirdû de ji sedî 25 bo jinan hatibû destnîşankirin, lê vê carê ji sedî 30'ê kursiyên parlamen ji jinan re ye. Bi vê ji 111 endamên Parlamena Kurdistanê divê 33 endam jin bin. Li gorî mercên komisyonê, di her lîsteyekê de ji sê berendaman pêwîst e yek ji wan jin be. Endamê Ofîsa Sekretaryeta Yekîtiya Afretên Kurdistanê Cule Hacî da zanîn, bi sedema di destnîşankirina berendamên jin de bo postên hizbî û fermî nêrîna Yekîtiya Jinan wernagire me gelek caran partiya xwe (PDK) rexne kiriye lê piştî gotûbêjan em lihevhatin danîna jinan ji aliyê partiyê ve bi hevahengî be.

Ev zêdeyî mehekê ye Yekîtiya Afretên Kurdistanê, lîsteya namzetên xwe daye partiya xwe. Di vê der barê de Cule Xan dibêje: "Piraniya ew kesên em piştgiriya wan dikin bibin endamên parlamen, jinên gênc in. Em dixwazin bikaribin jinên çalak û xwedî hêz ku di berjewendiya jin û xelkên Kurdistanê de bin bigihînin parlamen. Ne bi wê keça filan kes e yan dîploma wê heye. Di lîsteya xwe de me ew tişt li ber çav negirtine."

Bi baweriya beşekî ji jinan, ger hizib bê şewra rêxirawên jinan berendamên jin destnîşan bike, tê wateya ew piştguh xistine. Di vê der barê de Endama Parlamenê Kurdistanê Xeman Zirar wiha diaxive: "Ger baweriya hizbekê bi karê rêxirawên xwe hebe, jinekê hildibijêre ku rêxiraw piştgiriya wê bikin. Ya girîng ew jinên tên diyarkirin rewşenbîriyeke wan a giştî hebe û ji rewşa siyasî bi agah bin."

Endama Sekretaryeta Yekîtiya Jinên Kurdistanê Seywan Rustem, da zanîn ku Sekreterê Giştî yê YNK'ê Celal Talabanî di civîneke giştî de li gel Yekîtiya Jinên Kurdistanê ji wan re gotiye di mesela destnîşankirina berendamên jin de em ê bi we bişêwirin û domand: "Me pêşniyar kiriye mekanîzmak bo berendambûna wan jinan bê danîn. Em dixwazin jinekê bişînin parlamen nûnerê rast ê jinan be û bi mafê mirov ve girêdayî be." Lê li ba xelkê ne pir girîng e ew parlamenterên diçin parlamen ji aliyê hizban an rêxirawan ve bên hilbijartin, girîng ew e dengê jinan bin. Şehên Kerîm 27 salî ye, mijarê wiha rave dike: "Ya girîg ew e jina ku here parlamen zehmetiyên jinan dîtibin, ne keça berpirsekî bê danîn. Ger keçeke hejar a lihevhatî be, dizane rewşa jinan çawa ye. Bi taybetî derdê hejarî ku hîç hatineke jinan malê tune û hikûmet girîngiyê pê nade." Li gorî nûnerê Sekretaryeta Yekgirtûya Xwîşkên Îslamî yên Kurdistanê Hawraz Şêx Ehmed, Yekgirtû yekalî bûye û wan jinên ku niha li ser lîsteya wan li parlamen in dide alî: "Ew parlamenterên ku wê bên ger ji yên berê ne baştir bin pir xirab e, pêwistiya me bi guhertinê heye." **HEWLÊR**

# Li Erebistanê tîma basketbolê

Jiyana jinên Erebistana Siudî di her hêlê de hatiye dorpêçkirin. Lê jinan bi avakirina tîma basketbolê armanc dikin ku vê tabûyê xira bikin. Tîma basketbolê di sala borî de hate avakirin. Jinên ku basketbolê dilîzin formayên ku xetên bedena wan nîşan nade li xwe dikin. Endamê tîmê hemû jin in.

Tîma bi navê 'Jeddah United' hate avakirin welatiyên Erebistana Siudî matmayî dike. Ji ber ku cara yekem tîmek bi vî rengî ji hêla jinan ve tê avakirin. Jina bi navê Maina her tim li Amerîkayê basketbol lîstiye. Piştî ku Maina vegeriya hewl da ku tîmekê ava bike. Maina, diyar kir ku karê ku dikin gelekî zehmet e. Maina, destnîşan kir ku li Erebistana Siudî jin di nav faaliyetên sporê de cih nagirin û wiha axaftina xwe dom kir: "Bi avakirina tîma basketbolê dê beşdaraziya li hemberî jinê biguherînin. Xeyaleke me heye ku em jî rojekê tevlî olîmpiyatan bibin. Tîm du caran li Urdunê û carekê jî bi Yekitiya Mîrnişînên Ereban re derketine musabaqayê. **RIYAD**



## Depresyona piştî welidînê xetere ye

**AMED**

Dayik piştî ku zarok tînin dinê dikevin depresyonê. Depresyona ku piştî welidînê pêk tê li ser derûnî û bedena jinê bandoreke neyînî dike. Pisporan da zanîn ku piştî welidînê têkiliyeke taybet di navbera dayik û zarokan de çêdibe. Piştî ku zarok hate dinê jiyana jinê bi tevahî diguhere. Pisporan diyar kir ku herî zêde jin bi giliya depresyonê serî li doktoran didin. Di nava 100 jinan de 15 jin piştî welidînê dikevin depresyonê. Pisporan de zanîn ku depresyon di dema ducanîbûnê de jî pêk tê. Depresyon wekî girîna bê sedem, xwe sûcdarkirinê xwe dide der. Pisporan, da zanîn ku li dijî depresyonê divê dayik têkiliya xwe ji kesan nebire û ji kesên pispor alîkariyê bixwaze. Ji bo dayikan dewreke gelek zehmet e.

## Bo jinên cîhanê ajans tê avakirin

**PARÎS**

Neteweyên Yekbûyî li dijî şîdet û cudaxwaziyê ajansa jinan ava dike. Dê salek şûn de ajans bê avakirin û armanc dikin ku weki UNICEF'ê bi hêz be. Ajansa ku ji hêla Neteweyên Yekbûyî ve tê avakirin, ji bilî şîdeta li hemberî jinê, dê li dijî AIDS'ê têbikoşe. Milyarek dolar budçe ji bo ajansê hate veqetandin. Ji bo ajansên wekî yên penaber (UNHCR) û zarok (UNICEF) re bi milyaran pere tê veqetandin. Sekreterê Gişî yê YN' yê yê berê Kofi Annan di sala 2006'an de dest bi xebata avakirina ajansê kir. Bi pişgiriya welatên Îskandinav ve pêşketineke berbiçav pêk hat. Tê armanckirin ku heta dawiya salê ajans bê avakirin. Mijar dê li Lijneya Giştî ya YN'ê bê qebûlkirin.

## Ji bo piştgiriyê navenda jinan vebû


**STENBOL**

Ji hêla Komeleya Muteşebîsê ya Jinan (KAGİDER) Navenda Pêşketina Jinan 'Em' hate vekirin. Tê armanckirin ku bi vê navendê jinan tevlî qada kar bikin. Dê her sal der barê muteşebîsî û serokatiyê de perwerdehiyê bidin 300 jinan. Armanc dikin ku jinan di her qadê de pêş bixin. Organîzatorên xebatê da zanîn ku dê her sal hejmara jinan zêde bikin û jinan tevlî qada hilberînê bikin. Her wiha dê bi vê xebatê jinan di her hêlê de agahdar bikin. Perwerdehî dê ji hêla pisporan ve bê dayîn.

www.arsivakurd.org

Hawar
30 Gulan 2009 Şemî

# Ji çiyayên Kurdistanê çawa li jiyanê dinêrin?



**I AMED DÎCLE** BEHDÎNAN / ANF

Zarokên kurd ên li çiyayê bilind ên Kurdistanê tiştên li cîhanê diqewimin ji radyoyê dişopînin. Ancax li hin yekîneyan derfetên temaşekirina televîzyonê jî hene. Zarokên kurd li çiyayên Kurdistanê hemû cîhanê dişopînin

Em li yekîneyeke gerîla ya çend saetan dûrî navçeya Şemzînanê ne. Ji bo çêkirina nûçeyan û nîqaşê bi gerîlayan re bikin ji bo demekê em li vir in.

Li van çiyan tiştên li cîhanê diqewimin ji radyoyê tê şopandin. Ancax hin yekîneyên gerîla derfetên wan ên temaşekirina televîzyonê jî hene. Li yekîneya ku em bûne mêvan televîzyonek heye. Di dema saeta nûçeyan de çend deqîqeyan televîzyon tê vekirin. Dema em fersendê dibînin, bi gerîla û fermandaran re li ser meseleya kurd ku rojeva Tirkiyeyê dagir kiriye, çareserî û aştiyê diaxivin.

**Her yek ji cihekî ye**

Di nûçeyan de behsa 4 gerîlayên ku li Licê jiyana xwe ji dest dane tê kirin. Agahiya 4 gerîlayên li herêma Garisa jî li ser vê nûçeyê tê zêdekirin. Ew li televîzyonê dinêrin û nêrînên wan li ser wêneyên hevalên wan dicive.

Di vê yekîneya nêzî sînorên herêmê gerîlayên 21 sal in li ser van çiyayan e û yên saleke di nava gerîla de ne jî hene. Gerîlayên jin û mêr ên ji Urmiye, Amed, Botan, Efrîn, Silêmaniyê li vir hene. Ev kesên ku her yek ji cihekî ye, sedema wan a li vir, çawa, heta gihîştine vir serpêhatiyên jiyane, nivîsîna wan gelekî zehmet e. Di televîzyonê de axaftina dayikên gerîlayên ku zarokên wan li Garisa û Licê jiyana xwe ji dest dane, zarokên xwe yên li van çiyayan serbilind dike.

**'Çima ez ne li vir bim'**

Piştre behsa bîranînên bi hevalên xwe yên ku jiyana xwe ji dest dane û bîranînên xwe yên dawiyê dikin. Yên bi hev re wêne kişandine wêneyên xwe nîşan didin. Tiştê ku em dixwazin hîn bibin, li vê yekîneya gerîla, di temaşekirina nûçeyan de û piştre di hest û cîhana ramanan de mirov dikare bibîne.

Zarokên kurd ên li van çiyayên bilind û dûr ên Kurdistanê, her her roj li hemberî balafirên keşfê, FI6, topên havanê yên Îranê diavêjin gelekî baldar in.

Li ser rêgeha Qendîl, Xinêrê û Xakurkê em digerin. Li cihên ku gerîla lê bi cihbûne em derbas dibin û berê xwe didin çiyayên ku jiyan li wir hêj cidî û şewîtîner e. 'Hûn çima li vir in?'. Vê pirsa xwe ji hîn gerîlayên ku em rastî wan tên dipirsin. Ciwanekî bi navê Xemgîn wiha pirsa me dibersivîne: "Çima ez ne li vir bim. Em kurd in, ciwan in, mafên gelê me hatiye binpêkirin, welatê me hatiye parçekirin, serokê me girtî ye. Em ne li vir bin ma em ê li ku bûna."

**Ji nêz ve rojevê dişopînin**

Gerîlaya ku ji Stenbolê zanîngeha xwe di nîvî de hiştiye, gerîlayê ku li Şamê di sinifa dawî ya zankoya Tibê de terk kiriye û berê xwe dayê çiyê, gerîlayê ji Urmiyeyê ku dem bi dem bi bav û apê xwe re qaçaxçîtî kiriye, kuryeyê me yê ji kurdên Rûsyayê bersivên wan kêm zêde nêzî tiştên Xemgîn gotine ne.

Em bi gerîlayan re hevdîtîn û gotûbêjan dikin. Pirsên der barê nêzîkbûna pêvajoya 1'ê hezîranê, operasyonên berdewam dikin, hevalên wan ên jiyana xwe ji dest dane û tiştên li vir diqewimin çawa dinêrin dipirsin. Di rojeva gerîlayan de rênexşeya rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku di meha tebaxê de dê aşkera bike heye. Li vir gerîla bi awayekî hayjixwe nêzî daxuyaniyên rayedarên tirk dibin. Dibe ku pêvajoya aştiyê bi pêş bikeve, lê armanca dewletê li hemberî Tevgera Azadiya Kurd 'ji derve bihêle' bi awayekî zelal xuya dike.

Ew ji bo mafên gelê kurd ên hatine garantîkirin amade ne ku ji çiyê dakevin.

## Biryara kolektîf esas e

***Gerîlaya bi navê Rûken*** ku bi eslê xwe ji Mêrdînê ye û li Edeneyê mezin bûye, dema li zanîngeha Çukurovayê bû rahiştiye çentê xwe û berê xwe daye çiyayên Kurdistanê wiha dibêje: "Me biryara xwe ya şexsî da û hatin van çiyayan. Niha em endamên tevgerekê ne. Ji bo azadiya gelê xwe em hatine vir. Tiştê ji bo me ya girîng helwesta tevgera me û ya serokê me ye. Kî çi bêje ew qas ne girîng e. Em bi biryara xwe ya şexsî hatin van çiyayan, lê daketin an jî mayina li van çiyan bi biryara kolektîf dê bibe."

Roja din em didin rê, em li herêmeke din a gerîla ne. Em gerîlayên ku nû hatine û namzetê gerîla ne nas dikin. Ew nû hatine, gavên xwe yên li çiyê nû diavêjin.

Di demeke ku behsa efûya giştî, 'tiştên baş', nîqaşên çareseriyê tê kirin, bûyina bi gerîlayan re tecrûbeyeke balkêş e. Li cihên din çawa xuya dike nizanim, lê li vir xuya dike ku girêdayîn gavên dewletê biavêjine. Li vir ji xwe bawer in, bi hezaran ciwanên kurd ku ligel her roj agahiya hevalekî/ê wan jiyana xwe ji dest daye dîsa jî bi awayekî hesas tevdigerin û kontrolê ji dest bernadin.

Gerîla li vir tenê ne nîqaşên der barê jiyana wan û têkoşîna wan de temaşe dikin, bi derfetên xwe yên kêm mijarên der barê jiyanê de jî dişopînin. Gelek kare, îmge û tiştên hêja hene ku ji vir bêne veguhestin.

## Şahiya rojbûna Darwîn

Komeleya Piştevaniya û Dostanî ya Îmece (Îmece- Der) di çarçoveya şahiyên 200'emîn rojbûna Darwîn de biryara konferansek bi navê 'Darwîn û Teoriya werarê' li dar bixin.

Îmece- Der der barê şahiyên 200'emîn rojbûna Darwîn de li avahiya komeleyê daxuyaniyek çapemeniyê li dar xist. Serokê Komeleyê Mucelle Atalay di civînê de axivî û diyar kir ku komele li dijî tahrîbatên ku kapîtalîzm pêk tîne, xwediyê xeteke ku xweza û kedê diparêze ye. Atalay destnîşan kir ku ji bo vê jî divê mirov girêdayî zanistê bin. Atalay wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji ber vê sedemê em girîngiyê didin 200'emîn rojbûna Darwîn û 150 emîn salvegera Teoriya Werarê. Di navbera fêrbûna civak, zanistî û werarê de xeteke diyalektîk heye. Ji ber vê jî me biryar da ku em konferansek bi mijara 'Darwîn û Teoriya Werarê' li dar bixin."

Atalay da zanîn ku dê zanyarên wekî Prof Dr Rennan Pekunlu, Doç Dr Oguz Altingoz jî wekî axêvker tevli konferansê bibin. Konferans îro li Navenda Çanda Selahattîn Akçîçek û her wiha dê di 6 hezîranê de jî li Navenda Huner a Egeyê bê lidarxistin. **ÎZMÎR**



## Kevneşopiya sedsalan hate qedexekirin

Şahiyên lîstika bi navê 'Qamçi' ku her sal wekî kevneşopiyekê li navçeya Pîrana Amedê bi tevlibûna hezaran kesî tê lidarxistin, îsal ji aliyê leşkeran ve hate astengkirin. Bi hinceta ku pevçûn derdikeve ji bo pîrozbahiyê leşkeran destûr neda.

Li Pîranê her sal li qontarên çiya şahiyên wekî kevneşopiyekê dihatin pîrozkirin, îsal ji aliyê leşkeran ve hate qedexekirin. Leşkeran bi hinceta ku pevçûn derdikeve destûr neda pîrozbahiyan. Biryara qedexekirinê ji aliyê Fermandariya Qereqola Cendermeyan ya Gundê Dîmmeyê hate dayîn û her wiha şêniyên gundê Dîmme li dijî vê biryarê bertek nîşan da. Welatiyan diyar kir ku ev lîstik bi sed salan e tê lîstin û naxwazin ev kevneşopiya wan winda bibe. Welatiyê bi navê Hasan Îpek diyar kir ku ev kevneşopiya wan her sal di meha gulanê de dikeve roja pêncşemiya dawî û wiha pê de çû: "Pêwist e ku kevneşopî bên parastin. Eger ku neyên parastin, dê hin kes ji armanca xwe dûr bikevin û her wiha dê her tim li dijî van şahiyan hincetên cûda derkevin holê." Welatiyan demeke kin lîstika qamçiyê lîstin. Lê her salên din heta ku roj neçûya ava şolena wan berdewam dikir. Îpek anî ziman ku ji ber ku îsal destûr nehatiye dayîn şahiya wan hatiye betalkirin û girse belav bûye. **AMED**

## Li Çewlikê golên kraterî

Li devera Koyê Spî ya Herêma Puexê gelek golên kraterî rengek bedew didin xwezayê. Ji van yek jî gola 2 hezar 371 metreyan bilind a bi navê Gerdînal e. Gola ava wê bi tu deveran ve naherike, tevahiya biharê bi ava ji keviyên derdorê heliyayî tijî dimîne. Gola ku ava wê di nav gel de wekî avek şifayî tê zanîn, dibe wargeha hemû hemwelatiyên di vê herêmê re derbas dibin. **ÇEWLIK**



## Texrîbatên ekolojîk ditirsîne!

Li cîhanê bûyerên ku di nava 15 salên dawî de qewimînê bi awayekî aşkera nîşan dide ku ahenga ekolojiyê çiqas zirar dîtiye û xira bûye.

Li aliyekî bi milyonan kesên ku di nava xizaniyê de ne li aliyê din jî îsrafkirineke mezin heye li cîhanê. Cemedên cemseran dihelin û nifşên gelek sewalan roj bi roj tune dibin. Li cîhanê di encama lêkolînên ku 3 salan hatine kirin de derketiye holê ku sîstema ekolojîk zirareke mezin dîtiye û pêşeroj jî di bin xetereyê de ye.

*Kişandinên lêkolînê 3 sal berdewam kir û her wiha li 54 welatî pêk hat. Encamên lêkolîna Yann Arthus- Berntrand bi kurtasî wiha ne:*

Ji sedî 20 nifûsa cîhanê, ji sedî 80 çavkaniyên rojgerê (gezegen) bi kar tînin.

Li cîhanê alîkariya ku ji bo welatên pêşveçû tê kirin, ji 12'yî zêdetir ji bo leşkeran tê bikaranîn.

Di rojê de 5000 mirov ji ber ava qirêj dimirin. Milyarek mirov jî xwe nagihînin ava paqij.

Nêzî mîlyarek însan di sînorê birçîbûnê de ne.

Di cîhanê de ji sedî 50 çinandin ji bo sewal û şewatên biyolojîk tê bikaranîn.

Ji sedî 40 erdên ku ji bo çinandinê tên bikaranîn zirar dîtine.

Her wisa 13 mîlyon hektar daristan tune dibin.

Qadên seydvaniya masiyan ji sedî 4 tune bûne.

Di 15 salên dawî de germahiya herî bilind çêdibe. **FRANKFURT**